Dema bimrim

April 6, 2000

Dema bimrim, kurê negrî bi ser min da

Mirin naztir bûye îro ji van êşa

Ji ber zor û ji ber lêdana van xeyda

Me dil westî, wekî pîrê li ber kaşa

Felek har e, dilê min daye ber kêra

Belengaz û penah bûme li dinyayê

Kovî westa ji ber davan û nêçîra

Pelên dara me weşyane li ber bayê

Nema dîsa bi ser xwe bêm, bi yekcarî

Wekî gestim gelek maran ji nişka va

Nema ronî, di çavên min reşe tarî

Dema leylan xuya bûye, ketim dava

Şikestî dil di nêçîra xeyalên xwe

Tevî xewn bû, wekî çêrok û efsane

Me tûr vala, li ber dergahê gora xwe

Ewe maxa me ya paşîn û meyxane

Dema bimrim, ne pêwîstin gul û hêstir

Mifa nîne ji van girî û lorînan

Mirin wek min, hozanvanin gelek mestir

Bi hesret çûn, ji nav yar û ji nav zînan

Bihane hest û helbestên di wan zana

Hema tev çûn, bi xemgînî ketin gorê

Mixabin, çendî dilêşim Ji bo wana

Niha şagird li pey hosta ketî dorê

Kurê negrî, wekî min çûn, bi dilêşî

Gelek hêja ji van dostan û van yara

Hozanvan bûn, ketin axê, bi serxweşî

Hinek bêkes, serî danîn, ji xeyda ra

Hebûn ustad û pir zana qelem danîn

Peşîman bûn li jîna xwe di ristê da

Dîlan berdan, bi dilfîxan, gelek nalîn

Vehes dan xwe, cara pêşîn, di gorê da

Ejî, wek wan, dema deynim serî carek

Dilê „Cankurd“ vedawşînim ji toza reş

Cîhan dîsa dibe rohnî û bimbarek

Ji we giş nas û yaran re, dibe meyxweş